





Dilin Kısa Tarihi

Zimannasê îngiliz David Crystal vê berhemê cara pêşîn di sala 2010î de bi navê *A Little Book of Language* diweşîne. Pirtûk ji aliyê *Yale University Press* ve hatiye çapkirin. Ev berhem ji aliyê Tufan Göbekçin ve li zimanê tirkî hatiye wergerandin û cara ewilî di sala 2018ê de, cara duyem ji di sala 2019ê de ji aliyê weşanxaneyê ALFAyê bi ISBNya 9786051717173 ve hatiye çapkirin. Zimannas û akademîsyen Crystal (1941-) di qadeke berfireh a akademîyê de dixebite ku zimannasiya klînik û edlî, mirina zimanan, îndekskirin û ferhengnasî çend mijarên ji vê qadê ne. Herwiha, *Cambridge Encyclopedia of Language* û *The Stories of English* jî di nav de beşdarî nivîsîn û sererastkirina ji 120î zêdetir berheman bûye, ji ber pisporiya xwe ya di qada zimannasiyê de Nîşaneyê Împeratoriya Brîtanayê standiye. Wergêrê pirtûkê Tufan Göbekçin jî di qadên wekî edebiyat, felsefe û zanistê de ji 60î zêdetir pirtûk wergerandine.

Di serî de dixwazim balê bikişînim ser navê pirtûkê yê bi tirkî ku bi min ji ber vî navî ev pirtûk di nav xwendekarên zanîngehê de ne popûler e û zêde nehatiye nasîn. Navê pirtûkê yê resen *A Little Book of Language* (Kitêbokeke Zimên) ji aliyê wergêr ve wekî *Dilin Kısa Tarihi* hatiye wergerandin û nîşeyeke kurt li sernavê hatiye zêdekirin: *Îçinizdeki Dilbilimciyi Ortaya Çıkaracak!* (Dê Zimannasê di Hundirê We de Derxe Meydanê!). Herçend ev angaşt di cî de be jî ez wer difikirim ku ji ber di navê pirtûkê de peyva dîrokê (tarih) derbas dibe xwîner zû bi zû destên xwe navêjin vê pirtûkê da ku bixwînin. Erê Crystal serpehatiya zimên ji destpêkê heta roja îro vedibêje û herwiha ji taybetmendiyên herî bingehîn ên zimên heta bikaranînen wî yên civakî yên herî aloz, rêwîtiyeke kûr pêşkêşî mirovî dike lêbelê ev pirtûk ne derbarê dîroka zimên de ye. Li ser navê xwe dikarim bibêjim ku sedema bingehîn ew bû ku ev pirtûk ev ji salekê zêdetir e di refîka pirtûkan de stûxwar li benda xwendinê bû. Kesên ku bi zimannasiyê re eleqedar in dizanin ku ji dîroka zimên wêdetir çawa-xebitîna zimên mijareke balkêştir e. Lewma rojekê ku ev berhem ji bo kurdî (kurmançî) bê wergerandin, hêviya min ew e ku peyva dîrokê di sernavê pirtûkê de tune be.

Lûtkeya Everestê

Crystal ev berhem dabeşî 40 sernavan kiriye û di dawiya beşa 40em de dibêje ziman lûtkeya Everestê ya qadên xebatan e. Ziman hema bêje şîrîkê her tiştî ye. Mirov di jîyanê de çi karî bike -heta tu karî neke jî- ziman hertim pê re ye, çalak e. Lewma, Crystal hewl daye ku behsa hemû taybetmendiyên zimên bike. Herçi 40 sernav hebin jî ji ber ku meriv dikare van sernavan li gorî binbeşên zimannasiyê dabeş bike, zehmet e ku meriv yeko yeko behsa hemû sernavan bike. Çamcı (2019), di danasîna vê berhemê de hemû sernav dabeşî neh kategoriyan kiriye. Bidestxistina/wergirtina zimên, rêziman, malbatên zimanan, zarava, devok, rehên zimanan, ferheng-nasî, tîkiliya teknoloji û zimên, pragmatîk û taybetmendiyên bingehîn ên zimannasiyê hin mijarên vê berhemê ne. Di vê xebatê de ez ê bi awayekî giştîgir behsa mijarên berhemê bikim.

Mûcîzeyê Wergirtina Zimên û Mekanîzmaya Wê

Beşên destpêkê yên pirtûkê, li ser pêvajoya wergirtina zimên ya mirovî hûr dibin ku ev aliyê herî bingehîn û mûcîzewî yê zimên e. Crystal, balê dikişîne ser wê yekê ku “axaftina zarokane” (child-directed speech) ya ku em li hemberî zarokekî



BİNGÖL ÜNİVERSİTESİ
YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ DERGİSİ
Yıl/Year: 2025 • Cilt/Volume: 11 • Sayı/Issue: 22

Halil Akgül

xelilakgul@gmail.com

Orcid: 0000-0002-1966-2376

Doktora, Zanîngeha Bingölê, Beşa Ziman û
Edebîyata Kurdî

Makale Türü / Article Type:

Araştırma Makalesi / Research Article

Makale Geliş Tarihi / Received: 27.11.2025

Makale Kabul Tarihi / Accepted: 05.12.2025

Makale Yayın Tarihi / Published: 31.12.2025

nûzayî dikin, tevgerêke kenawer lê gerdûnî ye. Axaftina zarokane xwedî taybetmendiyên wekî melodiyeke zêdekirî ya deng, giloverkirina lêvan û dubarekirina heman îfadeyan e. Ev melodiya zêdekirî, jî bo kişandina bala zarokan û hînbûna rîtm û kirpandina zimên, qadeke pratîkê pêşkêş dike. Zarok hêj beriya jidayikbûnê jî di malzaroka dayikê de bi bihîstina dengên -bi taybetî jî dengên dayikên xwe, bi rêya rîtm û kirpandinê- dest bi pratîkê dikin, dibe ku jî ber vê sedemê be taybetmendiyên ku pêşîn tîr hînbûn rîtm û kirpandin in.


Dema ku zarok di mehên xwe yê pêşîn de tenê dengên girîn û xweşhaliyê derdixînin, ne pêkan e ku mirov diyar bike bê ka ev deng aîdî kîjan zimanî ne. Li gorî nivîskar hemû pitikên dinyayê di sê mehên ewilî de he-man dengan derdixînin. Pitik li gorî pêdiviyên xwe hin dengan derdixînin ku em jê re dibêjin “girîn”. Ev girîn li gorî pêdiviyê carinan bi dengê bilind û domdar e, carinan bi dengê bilind dest pê dike û her ku diçe nizim dibe û carinan jî bi bêhnvedanên kurt pêk tê. Ev hemû şêwe îşaretê bi pêdiviyên cuda dikin. Li dora şeş mehan, bi livandina lêvan derbasî qonaxa kîtekirinê (babbling) dibin; di vê serdemê de herçiqas dengên ku wekî “ma-ma”, “da-da”, “pa-pa”, “ba-ba” derdixînin dêûbavan kêfxweş bikin jî, haya zarokan hêj tune ye ku ev deng tîr wateya peyvên rasteqîn. Di meha nehem de, zarok dest bi teqlîdkirina rîtm û kirpandina zimanê ku li derdora wan tê axaftin dikin, ev jî nîşan dide ku ew hînî du taybetmendiyên giring ên zimên bûne; rîtm û kirpandin. Nivîskar, dema ku pêvajoya tevlihev a li pişt hînbûna peyvekê dinirxîne, destnîşan dike ku mejiyê mirov jî bo hînbûna zimên amade ye û hema bêje bi “mekanîzmeyeke wergirtina zimên” hatiye terxankirin. Heta dibêje ku para mezin a nifûsa dinyayê jî yekî zêdetir zimanî hîn dibin û bi axaftina van zimanan mezin dibin û ev jî rewşeke siruştî ye.

Piştî, nivîskar derbasî lêkolîneke bi hûrgilî ya fîzyolojîk a derbarê çawaniya hilberîna dangan dibe. Ji bo axaftinê hewcehî bi herikîna hewayê ya ku ji pişikan tê heye û bi lerizîna bi sedan caran a di saniyekê de ya tîlên dengî, perdeya dengî (kirpandin) tê diyarkirin. Cudahiya di navbera perdeyên dengî yê mîr, jin û zarokan de, girêdayî leza lerizîna tîlên dengî ye. Li gorî nivîskar bi peresînê (evolution) mirov hîn bûne ku dê çawa rêya hewayê û perdeya dengî bi kar bînin. Bilêvkirina dengan mijareke din e ku Crystal bi alîkariya şiklekî organên dengî dide nasîn. Dengên bizwên û nebizwên bi alîkariya van organên dengî tîr bilêvkirin: lêv (lips), diran (teeth), piştî diranan (teeth ridge), ziman (tongue), dev (mouth), bêvil (nose), difin (nasal cavity), çene (jaw), gûzika zengilorê (Adam’s apple), zimanê biçûk (uvula), qirik (throat), zimanê zengilorê (epiglottis), tîlên dengî (vocal folds), zengilor (windpipe), pişik (lung).

Rêziman, Standardîzasyon, Cihêrengî û Daraza Civakî

Crystal bi awayekî berfireh berê xwe dide van mijaran jî: hêmanên binyadî yê zimên (deng, peyv, rêziman), cihêrengiya di bikaranîna civakî de û bê ka ziman çawa diguhere. Bo nimûne, li gorî nivîskar rêziman, rêya hilberîna wateya peyvên e û alîkariyê dike ku nezelaliyê jî holê rake. Herwiha, çawa-guherîna rêzikên rêzimanî û cudahiya civakî ya di navbera bikaranînan standard û ne-standard de tê nirxandin. Piştî ku organên dengî yê zarokan tîr xwe dikemilin û êdî guncaw in ji bo axaftinê, zarok dikevin nava hewla axaftinê û peyvên ku jî derdora xwe dibihîzin, bi awayekî ne-rêzimanî bi kar tînin. Ji ber ku zarok van peyvên yekî yekî bi kar tînin (şîr, here, av, germ, li ku, çû, çepik û hwd.), zehmet e ku sohbekeke biwate pêk were. Li vir, rêziman dikeve dewrê, piştî meha 18em zarok dest bi sazîkirina risteyên kurt dikin (Dayê çû, şîr dixwazim, herin marketê û hwd.). Pirwateyîbûna peyvên jî bi qasî rêzîkirina peyvên giring e, peyv di hundirê risteyê de wateya xwe digire. Ev hemû mijarên rêzimanê ne û zarok hêj berî ku herin dibistanê bi awayekî siruştî gelek rêzikên rêzimanê hîn dibin.

Ziman, derbarê nasnameya axêver de jî nîşanên xurt pêşkêş dike. Zarava û devok, diyar dikin ku kesek ji ku derê ye. Nivîskar mînameke balkêş dide û dibêje naskirina devokan belkî zemanekî wekî mekanîzmaya xweparastinê jî hatibe



Organên dengî yê mirovî (Crystal, 2019, r. 53)

bikaranîn, ji ber ku dibe ku devokeke biyanî aîdî dijminan be lewma hewcehî bi baldarbûnê hebû. Li aliyê din, ziman li gorî temen, zayend û çîna civakî jî cuda dibe, heta ev cudabûn heya jargonên pîşeyî jî dirêj dibin (bn. îngilîziya tibbî, îngilîziya hiqûqî). Komên civakî bi hin peyvên xwe yên xweser, nîşan didin ku ew hevdu nas dikin û ji hev in.

Nivîskêr/nivîskarî mijara rastnivîsînê jî paşguh nekiriye, Crystal mijarên rastnivîsînê wekî mîna keke balkêş derdixe pêş ku dînamîkên dîrokî û civakî yên zimên nîşan dide. Bo nimûne, zehmetiya rastnivîsîna zimanê îngilîzî, ji ber wê yekê ye ku ziman di maweya zêdetirî hezar salan de di bin bandora zimanên cihêreng ên wekî fransî, felemenkî û latînî de maye. Jê wêdetir, bi destwerdanên ferhengnivîsînê wekî Noah Webster re, di navbera îngilîziya Brîtanî û Amerîkî de cudahiyan rastnivîsê derketine holê; vê yekê jî nîşan daye ku hewldanên standardîzekirina zimên girêdayî tercîhên civakî ne. Crystal, giringiya zanîna rêzikên rastnivîsê, bi mînakên serlêdanên ji bo karan û zehmetiyên pratîk ên ji bo dîtina navnîşana rast a malpera înternetê rave dike; îdia dike ku heger sîstemeke rastnivîsê ya standard tunebûya, dê înternet jî hilweşiya. Wekî beşeke rastnivîsînê, xalbendî jî di bikaranîna zimên de cihekî giring digire. Xalbendî dikarin wateya risteyan biguherîne; xal, pirsên nîşan, baneşan an jî sêxal, her yek wateyeke cuda dide risteyê. Lê helbet divê ji bo xalbendiyê jî rêzik hebin. Bikaranîna kêman jî zêde dê pîrsgirêkan derxin. Crystal derbarê vê mijarê de behsa meseleyeke wiha dike: “Oscar Wilde carekê wiha gotibû: Ji sibehê heta nîvro min hewl da ku helbesteke xwe sererast bikim û min bêhnokê jêbir. Lê piştî nîvro min dîsa ew bêhnok lê zêde kir.”

Ragihandina Nûjen, Zimannasiya Sepandî

Nivîskar di beşên din de bala xwe dide fonksiyonên zimên ên li dinyaya modern û zehmetiyên/astengiyên nû yên ku ziman tûşî wan dibe. Guherîna zimên a herî mezin a sed sala 21em bi şoreşa elektronîk re pêk hatiye. Înternet û telefonên destan şeweyên ragihandinê yên nû yên wekî peynguhêriya lezgin (instant messaging) afirandiyê. Crystal, berevajî baweriya belavbûyî ya ku dibêje ev awayên nû yên nivîsînê bi taybetî rastnivîsîna ciwanan xera dike, diparêze ku ev ciwan bi îngilîziya standard jî gelekî baş dizanin lê ji bo ku li hawirdora elektronîk bi lez binivîsin; kurtenivîs, argo û emojiyên nû bi kar tînin. Nivîskar, destnîşan dike ku rêjeya kurtkirinên ku di peynguhêriyê de tên bikaranîn bi pîranî di navbera %10 û %20î de ye û kurtkirinên wekî “u” (you/tu) di rastiyê de xwe dispêrin wan xaçepirsên/tiştanokên “rebus”an ên beriya 200 salan; bi vî awayî nivîskar hewl dide vê mîta “zimanê nû” pûç bike.

Crystal, diyar dike ku armanca bingeîn a zimên ji ragihandinê wêdetir, xwedî gelek fonksiyonên cuda ye wekî listina listikan, derbirîna nasnameyê, nîşandana hestan, domandina têkiliyên civakî û heta alîkariya fikirînê. Herwiha, balê dikişîne ser retorîkê (hunera îqnakirinê) ku bi rêya retorîkê ziman dikare bandorê li mirovan bike; bi taybetî xwederiya manîpulatîf a hilbijartina peyvên a di reklam û siyasî de, armanca dike ku hişmendiya/bîrbirina retorîk a xwîner zêde bike. Ev aliyê hestiyarî û civakî yê zimên, nîqaşên li derdora têgeha “durîstbûna polîtîk” (political correctness) jî bi xwe re tîne. Wekî encama hewldanên tevgerên wekhevîya civakî, derxistina hin peyvên biçûkxistîner ji zimên (bn. cudakariya zayendî ya di navên pîşeyan de), hewldana zimanî ya ji bo nîşandana hesasiyetên civakî nîşan dide.

Di dawiyê de, David Crystal balê dikişîne ser zimannasiyê û qadên wê yên sepandî û nîşan dide bê ka ew çiqasî bi rolên krîtîk radibin. Zimannasî hewl dide fahm bike bê ziman çawa dixebite û bi binbeşên xwe yên wekî dengnasî, watenasî, sosyolînguîstîk, psîkolînguîstîk, zimannasiya dîrokî û yd. ve çawa tê sepandin. Zimannasî dema ji bo çareserkirina pîrsgirêkan tê bikaranîn êdî dibe zimannasiya sepandî. Zimannasiya sepandî, ji alîkariya ji bo zarokên ku ji bo axaftinê dereng ketine bigire (terapiya ziman û axaftinê), heta bipêşxistina metodên hindekariya zimanê biyanî û heta tespîtkirina nasnameya sûcdaran (zimannasiya edlî) feydeyên şênber dabîn dike.

Encam û Nirxandin

David Crystal di vê berhemê de, ji wergirtina takekesî heta curbicuriya gerdûnî, ji veguherîna dîrokî heta teknolojiya nûjen, bi hemû aliyan ve li ser zimên disekine ku ew parçeyekê yekpare/venegetbar a hebûna mirovan e. Pirtûk, bi rêya 40 beşên kurt û kurmancî, bi hostayî ji xwîneran re radigihîne ku ziman xwedî bin-

yadeke bi qasî lûtkeya Everestê aloz e, lê di heman demê de mûcîzeyek e ku her yek ji me di jiyana rojane de bi hêsanî bi kar tîne.

Crystal, zimên tenê ne wekî mijareke lêkolînê lê wekî çavkaniyeke jiyanî ya ku divê were parastin dibîne. Balê dikişîne ser xetereya wê ihtimalê ku di vê sedsalê de dibe ku nivê zimanên dinyayê bimirin û xwîneran vedixwîne ku xwedî li cihêrengiya zimanên dinyayê û cihêrengiya dinyaya zimanê xwe derkevin, zimanên nû hîn bibin û li hemberî kesên ku derbarê hînbûn û bikaranîna zimanê xwe yê dayikê de zehmetiyan dikişînin baldar bin û alîkariya wan bikin. Pirtûk diyar dike ku ziman me tenê nahêle, hertim di hişê me de ye û her tiştê di jiyana me de dîteşîne.

Axirî, herçi wergera navê wê yê bi tirkî ne bi dilê min be û ji sedî sed temsîla naverokê neke jî, bi giştî ev berhem derbarê zimannasiyê de ye û dikare bibe pirtûkeke destpêkê ji bo kesên dixwazin li ser zimannasiyê bixebitin an jî bala wan li ser mijara zimannasiyê ye. Bi taybetî xwendekarên lîsansê ku di serî de vê berhemê bixwînin hem dê qada zimannasiyê nas bikin hem jî dê potansiyela xwe ya derbarê zimannasiyê de ferq bikin. Bi vî awayî ev berhem dikare bibe derî ji bo xebatên berfireh û kûr. Helbet, zimanê berhemê ewqasî zela e ku meriv tenê ji bo zanîna/çanda giştî jî dikare bixwîne.

Çavkanî

Crystal, D. (2010). *A Little Book of Languages*. Yale University Press.

Crystal, D. (2019). *Dilin Kısa Tarihi* (T. Göbekçin, Trans.; 2nd ed.). ALFA Yayınları.

Çamçı, B. (2019). *Dilin Kısa Tarihi*. Dil Araştırmaları, 13(25), 208-217.